# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1235 | 1-Çile-2025 | www.ronahi.net/ku/



**Navnîşan**

www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55

nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218


## Hejmara (24) a Kovara Şermola derket




Hejmara (24) a kovara Şermola ya wêjeyî û çandî ku bi zimanê kurdî û erebî tê weşandin, derket.

Dosyaya vê hejmarê “Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê” ye , di hejmarê de hejmarek ji mamosteyên zanîngehan nêrînên xwe li ser felsefe û rola Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, anîn ziman.

ji pêşekiya hejmarê: “Niha li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê sê zanîngeh hene; Zanîngeha Rojava (2016), Zanîngeha Kobaniyê (2017), Zanîngeha Şerq (2021). Armanca damezrandina van zanîngehan; pêkanîna pêwîstiyên herêmê ji hêla cîbicîkirina kêrhatinên zanistî û amadekirina pisporan di warên curbecur de ye. Di heman demê de van zanîngehan Derfeteke ji xwendekarên Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê re vekir, da ku xwendina xwe temam bikin, her wisa xwendekarên ku ji ber sedema şerê ku li Sûriyeyê diqewimî, ji xwendina xwe qut bûbûn, xwendina xwe berdewam bikin.

Bêguman ev zanîngeh di şert û mercine ne normal de hatin damezrandin, yanî di rewşeke ku hebûn û tunebûna me di nîqaşê de bû, her wisa ku jiyankirin bi xwe jî zehmet bû, di rewşeke wisa de li kêleka gelek saziyan zanîngeh jî hatin damezrandin, lewma ji hêla derfet û imkanan ve kêm û kurtî pir bûn, di hêla akademîk, rêvebirin û peydakirina akademîsyen û pisporan de jî zehmetî dihatin dîtin. Her wisa ji ber şert û mercên şer, gef û ambargoya li ser Rojava di hêla madî de jî astengiyên mezin hebûn û hîn jî hene. Lê niha piştî derbasbûna gelek salan di ser avakirina van zanîngehan de, tevî ku kelem û asetnegî hîn jî hene, lê bi awayekî berçav ku ji her kesî ve diyar e, ev zanîngeh pêşketinên mezin dijîn û ji gelek aliyan ve rewşa wan tekûz dibe. Ji bo girîngiya van zanîngehan û rola wan a bêsînor di avakirina nifşên nû de û ji bo ku bêhtir em balê bikişînin ser wan, desteya sernivîskar a kovarê girîng dît ku di dosyaya vê hejamrê de bi awayekî berfireh ev zanîngeh ji hemû aliyan ve bêne naskirin”.

Her wiha di hejmarê de çend nivîsên wêjeyî û çandî ku ji aliyê nivîskarên Rojavayê Kurdistanê ve hatine nivîsîn, hene.

Hejmara (24) a kovara Şermola 156 rûpel in, bi kurdî û erebî hatiye çapkirin.

Di beşa kurdî de ev berhem hene:

**Pêşekî**
- Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê.. (Desteya Sernivîskariyê)

**Dosyaya Hejmarê (Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê)**
- Li ser felsefeya zanîngehên Rojavayê Kurdistanê mitaleyeke giştî.. Zanist wê çawa dîsa bibe ya civakê?.. (Luqman Guldivê)
- Zanîn, Lê Çawa û di Ber Çi de?.. (Ferat Gernas)
- Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê.. (Emel Me’mo)
- Armanca Damezrandina Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê..(Aras Hiso)
- Beşa Ziman û Wêjeya Kurdî; Erk û Berpirsyarî.. (Aram Hesen)

**Hevpeyvîna Hejmarê**
- Li gel Şervan Misilm hevserokê Zanîngeha Kobaniyê ye (Hevpeyvîner: Aram Hesen)

**Lêkolîn**
- Ji helbestên Melayê Cizîrî: PUR MEKE ISRAFÊ .. (Diyar Bohtî)

**Pirtûk**
-Nirxandinek der barê romana “Dara Hinarê” de .. (Ferîde Ibrahîm)
- Pirtûkên Derketî.. (Desteya Sernivîskarîyê)

**Serbest**
-Penaberî.. (Salihê Heydo)

**Çîrok**
-Mêkut.. (Mihemed Emîn Sadûn)

**Helbest**
- Finda Rojhilat.. (Beşîrê Mele Newaf
- Tu li çi digerî?.. (Newaf Hemed)

**Ciwan û Wêje**
Metin û xwîner.. (Sewsen Şêx Bekir)

## Perwerdeya Govendên Kurdistanê dest pê kir

Navenda Nûçeyan

**Perwerdeya Govendên Kurdistanê ku dibistana çand û hunerê ya girîng a Kurdên li Ewropayê ye, destpê kir. Li dibistanê 20 mamoste dersê didin, 122 şagirt jî tevlî perwerdeyê dibin.**

Fîstanên Kurdan ên bi rengên kesk, sor, zer, spî, şîn û binefşî… Êlek û qutikên bi nexşên gulgulî… Ji Botanê heya Behdînanê şal û şepikên cûr be cûr… Kitan û Kofî… Cilûbergên ji ermîşm, pembû û hiriyê.

Ev der dibistana govendên Kurdistanê ye… Em li ku binêrin derseke din derdikeve pêşiya me… Em li vî cihî hest bi xweza, deşt û newal û bajarên Kurdî dikin…

### 7 şagirt wê beşdarî ezmûnê bibin

Dibistana Govendên Kurdistanê, ji sala 1997’an heta niha dersên govendên gel û lîstikvaniyê dide. Dawiya her salê jî dersên fînalê tên dayîn. Dersên fînalê hefteyekê didomin. Şagirtên ku di nava 4 salan de beşdarî dersên fînalê bûne, dema ku ji ezmûnên xwe jî derbas bûn, bawernameya lîstikvaniyê bi dest dixin.

Ji bo bawernameya derçûnê divê tezek jî were nivîsandin. Çarçoveya tezan çand û huner e. Îsal ji 122 şagirtan tenê wê 7 ji wan bikevin ezmûnên derçûnê.



Dersên tên dayîn

Şagirtên îsal beşdarî kampê bûne ji Elmanya, Fransa, Swîsre, Hollanda û Awûstûryayê hatine. Şagirt hînî govendên van herêman dibin: Agirî, Amed, Botan, Colemerg, Gimgim, Îdir, Qerecdax, Qoçgîrî ve Riha. Nêzî sed govendên cuda yên van herêman tên hînkirin.

Her wiha dersên cil û berg, aheng, zanist û huberê jî di nav bernameyê de cih digirin. Ders ber bi êvarî bi dawî dibin. Piştî şîvê, carna semînerên derbarê çand û hunerê de didin şagirtan. Carna jî şagirt tên ba hev û hemû bi hev re xwepêşandanê dikin.

Îsal di pola yekemîn de 49, di pola duyemîn de 25, di pola sêyemîn de 20 û di pola çaremîn de 7 şagirt perwerdeyê werdigirin. Şagirtên salên bihurî derçûne jî li vir amade ne. Ji bo ku wan amadeyî mamostetiyê bikin, ji bo wan bernameyeke cuda hat danîn. Dersên pisporiyê yên wekî lêkolîn, dengbêjî, pedagojî, teknîka govendên gelêrî, aheng (dahol û zirne) û jurîtiya mihrîcanan di vê bernameyê de tên dayîn.

### Amadehiya sala nû

Govendên Kurdistanê, giringtirîn saziya govendê ya Kurdên Ewropayê ye. Xebatên xwe li dehan navendên cuda û bi gelek komên cuda yên govendê re didomîne. Govendên Kurdistanê, bi salan e di vê qadê de kampên perwerdeyê û festîvalan lidar dixe û li komaleyan kursên govendên gelêrî dide. Xebatên tevahiya salê tên kirin di van kampan de tên nirxandin. Zêdehî û kêmasî tên nîqaşkirin. Ya herî girîng jî amadehiya sala bê û plansaziya wê tê kirin.

Dersên cil û bergan (kostum) balkêş in. Dema ku mamoste teknîkên sergirêdanê vedibêjin, kesrevan, kofî û kitanan nîşan didin û behsa hemû taybetiyên herêmî û çêkirina wan dikin. Perwerdeyên îsal ji bo bîranîna endamê Kevana Zêrîn Şehîd Şoreş Semsûr (Devrim Çoban) hatin kirin.

Bi kamîreya Hemza Sêvo



Bajarê Qamişlo

## ‘Cîhan Bîlgîn heya kêliya dawiyê şopedara heqîqetê bû’



Nûçegihana ANHA’yê Sîma Birokê diyar kir ku bi hedefgirtina hevalên wan yên rojnamevan wê nikaribin, rê li ber xebatên Çapemeniya Azad bigirin û got, “Cîhan bi hezkirina ji welatê xwe re rojnamevantiyeke bê sînor tacîdar kir.”**R-2**

## Rêber Apo sembola azadiya gelê kurd e

Endamê Komîteya Lihevanînê ya kantona Cizîrê Nûredîn Şakir diyar kir ku pêngava azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ku di 10’ê Cotmeha 2023’an dest pê kiribû li ser raya giştî û li giştî cîhanê bandoreke erênî kir, li çar parçê Kurdistanê û di cîhanê de Rêber Apo wek sembola azadiyê tê dîtin.**R-6**




# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1235 | 1-Çile-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S




## ‘Girtîgehên li herêmên dagirkirî ji Sêdnaya ne cudatirin’

Rêvebera Komaleya Mafê Mirovan a Sûriyê Evîn Cuma da xuyakirin ku kiryarên li herêmên dagirkirî tên kirin li dijî zagonên mafên mirovan e û wiha got: “Girtîgehên herêmên dagirkirî û kiryarên ku li wan deveran tên kirin, ji girtîgeha Sêdnaya ne cûdatire.”**R-5**

# LI SER ŞOPA HEQÎQETÊ

Ragihandina Azad rêwîtiya xwe ya ronîkirin û teyisandina rastiyan, bi têkoşînek gelekî dijwar dagirtî ye. Helbet têkoşîna li ser şopa heqîqetê, afirînerî û berhemên ku derketine holê bi hêsanî çênebûn. Di vê riyê de bedelên gelekî giran hatin dayîn, tevî hemû êriş û zextên giran yên li dijî Ragihandina Azad tên kirin jî, qehremanên demê bi pênûs û kamereya xwe, rêwîtiya xwe dewam dikin û li hemberî dagirkeran dibin bersiv. Ji destpêka Şoreşa Rojava ve û heta niha, 30 pêşengên Ragihandina Azad gihaştine asta şehadetê.**R-3**






## Dewleta Tirk dixwaze li Bakur û Rojhilatê Sûriyê DAIŞ’ ê nûjen bike’

Hevserokê Kongra Islama Demokratîk Ebdulkerîm Saroxan diyar kir ku piştî têkçûna rêjîma Baas, dewleta Tirk û hevkarên wê dixwazin bi nûjenkirina DAIŞ’ê re armanca xwe ya dagirkirina axa Sûriyê pêk bînin û berjewendiyên xwe bidest bixin.**R-4**



## Ji çiraxên hunera kurdî

Hunermend Nûhad Yûsif bi dengê xwe yê çiyayî ku hemû guh û çêjan şa dike navdar e, wî bi stranên xwe yên filklorî deng daye heta ku bûye yek ji hunermendên kurd ên herî girîng li Sûriyê û gelek stranên kurdî yên netewî, filklorî û dildarî pêşkêş kirine.**R-7**


**`Jin gunehkarin`!** — Nehîr pale — R-2

**Gelê Kurd dê bi Rêbertiya xwe re bi serbikeve** — Zekî Bedran — R-5



**Kodên hevdîtina li Îmraliyê** — Farûk Sakik — R-5



**Rewşenbîr û yekrêziya tevgera kurdî** — Kemal Necim — R-7

# ‘Cîhan Bîlgîn heya kêliya dawiyê şopedara heqîqetê bû’

Nûçegihana ANHA’yê Sîma Birokê diyar kir ku bi hedefgirtina hevalên wan yên rojnamevan wê nikaribin, rê li ber xebatên Çapemeniya Azad bigirin û got, “Cîhan bi hezkirina ji welatê xwe re rojnamevantiyeke bê sînor tacîdar kir.”

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Rojnamevan ji bo derxistina heqîqetê û rastiya gelan têkoşînê dikin, ked û xebatekî pir mezin û hêja didin. Dijminê ku naxwazin ev rastî, rûreşî û dirûtiya wan derkeve, rojnamevanan hedef digre, bi vê armancê nêzî eynika civak û rojnamevanan dibe, ji ber wê jî her li cihê ku şer diqewime, cihê ku yek rojnamevan berxwedana gelan derxîne ew yekser ji aliyê dewletan tên hedefgirtin, bi taybet ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve. Dewleta Tirk ne cara yekemîne rojnamevan hedef digre, her ku bixwaze dengê berxwedana gel neghê raya giştî û gel bi hev moralê xwe bilind nekin, rojnamevanan dike armanc, da ku rê li ber derxistina heqîqetê bigire, ji ber wê rojnamevan Cîhan Bîlgîn û Nazim Daştan di 19 Kanûn 2024’ an de dema karê xwe yê rojnamevaniyê dimeşandin, li ser rêya di navbera Bendava Tişrîn û bajarokê Sirînê de, ji aliyê balefireke bê mirov û biçek a dewleta Tirk ve hatin hedefgirtin. Di encama êrişê de her du rojnamevan şehîd bûn.



**Kurtejiyan rojnamevan û şehîd Cîhan Bîlgîn**

Rojnamevan Cîhan Bîlgîn di 26’ê Cotmeha 1996’an de, li navçeya Mîdyadê ya bajarê Mêrdînê ji dayik bûye. Cîhan weke keçeke kurd, di nava malbateke ku hestên welatparêziyê li pêşe mezin bûye. Malbata wê ji 5 xweşik û 4 bira pêk dihat, herwiha ji Cîhan biçûktir xuişkek û birayek bû. Şehîd Cîhan li zangîngeha Amedê Diclê beşa Edalet bi dest xist. Cîhan di sala 2013 û 2014’an de çû Amedê, piştî ku ew derbasî zangîngehê bû, lêgerîna wê ya ji bo derxistina rastiya dijmin xurt bû û xwendina wê ji rewşa heyî ya ku li Kurdistanê tê qewmandin re çêbû.

Cîhan naskirina xwe ji rewşa kurdan re kêm dît, ji ber dixwest her kes rastiya ku li ser kurdan tê kirin, nas bike, lewra derbasî xebatên çapemeniyê bû. Cîhan ji bo derbasî qada Rojava bibe, şahidiya şoreşê bike û ji nêz ve bişopîne, di heman demê de vê şoreşê ji cîhanê re belav bike, li ser vê daxwazê di sala 2017’an de ji Bakur Kurdistanê derbasî xaka Rojava bû. Cîhan li Rojava cihê xwe di nava nûçegihantiyê li gel Ajansa Hewar (ANHA)’yê girt. Cîhan heya kêliya dawî ji jiyana xwe, xebatên nûçegihantiyê li gel Ajansa Hewar (ANHA)’ê dikir.

**Cîhan kêlî bi kêlî şopdarê rastiyê bû**

Hin pêngavên rêzgarkirina bajaran ku li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk hatin, Cîhan ji nêz ve ew şopandin, mîna pêngava rêzgarkirina Reqa, piştî wê êrişên dewleta Tirk ên ku li ser herêmê mîna li li Tiltemir, Zirgan û Eyn Îsa şopandin, li kêlek wê operasyonên QSD’ê û Hêzên Ewlekariya Hundirîn li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk dihatin, herî dewayî jî êrişên dewleta Tirk ên li ser herêmê kêlî bi kêlî dişopandin.

**‘Divê para min jî di şoreşê de hebe’**

Armanca tevlîbûna Cîhan ji qada ragihandinê û derbasbûna wê ji axa Rojava re, ji ber wê nikarîbû çavê xwe ji wijdanê xwe re bigirta û dengê xwe bida seknandin û wiha digot: “Li Kurdistanê cihekî ku şoreşê lê çê dibe û divê pareke min jî di vê şoreşê de hebe. Ez dengê wê şoreşê baş û bi awayekî xurt weke hevalên xwe ên di çampemeniya azad de kar dikin, li Rojavayê Kurdistanê têkevim nava wê xelekê û li cîhanê belav bikim” Cîhan li ser vê armancê xebatê xwe yê ragihandinê pêk anîn.

Derbarê Rojnamevan û şehîd Cîhan Bîlgîn, nûçegihana Ajansa Hewar (ANHA)’ê Sîma Birokê ji Rojnameya me re axivî.

Sîma Birokê diyar kir ku hevreya wan Cîhan ji bo welatê xwe rojnamevantiyeke bê sînor tacîdar kir û wiha got: “Dema em behsa hevaltî û jiyana hevreya me Cîhan Bîlgîn bikin, bêguman wê gelek hurgiliyên ku em bînin ziman hebin, lê tişta ku niha em dikarin bêjin hevreya me Cîhan gelek Salan li Bakurê Kurdistanê, li hemberî desthilatdariya AKP’ê li ber xwe da. Cîhan ji xebatên belavkariyê dest bi xebatên ragihandinê kir, belavkariya ku her roj li kolanan rastî zextên polîsên dewleta Tirk dihat. Tevî van zextan jî, li ber xwe da û xeta têkoşînê dewam kir. Cîhan bi hizkirina ji welatê xwe re, rojnamevantiyek bê sînor tacîdar kir.

Hevreya me Cîhan ji bo xebatê xwe bide meşandin, sînor nas nekir. Hevreya me Cîhan zexta dijmin li ser gelê xwe yê Kurdistanê qebol nekir, lewra berê xwe da Şoreşa Rojava, di nava şoreşa Rojava de, navê ku şoreş lê hatiye kirin Şoreşa 19’ê Tîrmehê ya gelan, di heman demê de şoreşa jin bi van navan, wateya wan jiyan kir, hem jî di nava xebatê xwe de pêk anî, çingî dixwest bi van navan, deng û rengê şoreşê derxîne pêş çavê cîhanê, herwiha ji malbatan heta bi aliyên qadên siyasî bi giştî û bi taybet ked û xebat jin, têkoşîna jin di nava şoreşê, hem têkoşîna jin li Bakur, Başûr û Rojhilatê Kurdistanê derxîne pêş, di heman demê de ji bo wê ne asteng bo ku xwe bighîne jinên cîhanê.”

**‘Em ê her bi Cîhan re jiyan bikin’**

Sîma Birokê axaftina xwe wiha dewam kir sekna parastina nirxê hevaltiyê li cem hevreya wan Cîhan xurt bû û wiha got: “Taybetmendiyên hevala me yên ku em bînin ser ziman gelek in, lê ev taybetmendiyên giştî ne, ji xwe fedekaritî, jêhatîbûn û sekna parastina nirxê hevaltiyê li cem hevreya me pir hebû, em ê her wê bînin ser ziman û di nav me de jiyan bike.”

**‘Wê nikarin rê li ber xebatên çapemeniya azad bigirin’**

Sîma Birokê axaftina xwe wiha qedand: “Em ê her li pey şopa hevalên xwe yên şehîd bin û her li ser lingan bin ji bo em xebat û erka li ser milê xwe ya ku hevalên me yên şehîd hêvî dane me pê, bidomînin. Peyama me jî ew e ku wê tu carî nikaribin bi êriş û hedefgirtinan rê li ber xebatên çapemeniya azad bigirin.”

# Çeteyên Erdogan wê li ber felsefeya ‘Jin, jiyan, azadî’ têk biçin

**Navenda Nûçeyan**

**Endamên Meclisa Dayikên Aştiyê ku bertek nîşanî êrişên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dan gotin: “Şerê wan ê herî mezin li hemberî jina ye. Wê wekî berê li ber felsefeya ‘Jin, Jiyan, Azadî’ têk biçin.”**

Çeteyên şefên faşîst Erdogan-Bahçelî piştî Helebê dagirkirin êrîşên li dijî bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî zêde bûn. Ji ber êrîşên ççeteyên HTŞ-DAIŞ’ê yên dewleta Tirk a dagirker bi deh hezaran kes neçar man koçî herêma Şehbayê bikin. Her wiha bejahiya Minbicê jî dîsa dibe hedefa êrişan. Endamên Meclisa Dayikên Aştiyê yên Amed û Êlihê bertek nîşanî êrişan dan.

Dayika Aştiyê Meryem Tûran anî ziman ku armanca sereke ya êrişan destkeftiyên kurdan e. Meryem Tûran got: “Divê êdî zarok, sivîl û jin neyên kuştin. Em vî şerê qirêj şermezar dikin. Em aştî, yekîtî, azadî û biratiyê dixwazin. Êdî bila bes zarokên me bimirin. Êdî bes e. Dest ji lîstikên xwe yên qirêj berdin.”

Dayika Aştiyê Murvet Demîr ku got “Em bi çekên NATO’yê tên kuştin” wiha got: “Em bi salan e dibêjin ‘aştî’. Ji bo aştiyê destê xwe yê rastê dirêj dikin, bi destê çepê jî lêdixin. Êrişî zarokên me dikin. Bi tanq, top û balafiran dixwazin kurdan biqedînin, lê kurd naqedin. Belesebeb vî şerê qirêj dimeşînin. Dest ji vî şerê qirêj, pêkanînên li dijî mirovahiyê berdin. Çi karê we li Rojavayê heye?”

Dayika Aştiyê Kamîle Şîmşek a li Êlihê dijî, bûyerên li Sûriyeyê diqewimin wekî “lîstika dewletên emperyalîst” nirxand. Kamîle Şîmşekê got: “Bêyî destûr û planên dewletan, di nava 2 saetan de tevahiya Helebê nedihat dagirkirin. Em vî şerî naxwazin. Tirkiye dibêje ‘Em nîn in’, lê bila kesî nexapînin. Hemû çeteyên girêdayî wê ne.”

Kamîle Şîmşekê bang kir û got: “Xizmên me bang li me dikin û ji me re dibêjin ku ew bi mirinê re rû bi rû ne. Divê hemû gelên cîhanê li dijî vî şerî bibin yek. Gelê kurd divê li herîd erî dakeve qadan û bertekên xwe nîşan bidin.”

Dayika Aştiyê Nuran Seçkîn jî got ku DAIŞ bi navên cuda êrişên xwe didomîne. Nûran Seçkînê got: “Ev serê mirovan jê dikin, tecaiwzkar in. DAIŞ’î ne. Ev şer, şerê ji nû ve vejandina DAIŞ’ê ye. Serokê Sûriyeyê Beşar Esad nekarî saetekê jî li ber xwe bide, bi sed hezaran jin, zarok û extiyar radestî çeteyan kir. Bi navê îslamê, serê mirovan jê dikin û tecawizî wan dikin. Ev dijminê îslamê ne. Şerê wan ê herî mezin li hemberî jina ye. Wê wekî berê li ber felsefeya ‘Jin, Jiyan, Azadî’ têk biçin.”

Dayika Aştiyê Maşallah Kaya jî diyar kir ku daxwazên kurdan ên aştiyê bi şer hatine bersivandin. Maşallah Kayayê destnîşan kir ku divê kurd li dijî êrişan bi hev re tevbigerin û banga hişyariyê li raya giştî ya navneteweyî kir.



Dayika Aştiyê Şukran Dal jî bal kişand ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê paradîgmaya azadiya jinê û ekolojîk zindî bûye û got ku armanca êrişan ev paradigma ye. Şukran Dal êrişên sala 2014’an ên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi bîr xist û wiha got: “Çawa di sala 2014’an de winda kirin, wê dîsa winda bikin.”

## Ji Pênûsa Jin

### `Jin gunehkarin`!

**Nehîr Pale**

Civaka zayendperest hîna di vê zîhniyetê de israr dike û biryar nedaye ku bide guhertin. Ji xwe hemû tevgerên olperest li ser vê zîhniyetê rê û rêbazên nêzîkatiya ji jin re diyar dikin. Dewlet jî li ser vî bingehî têkildarî jin zagonan diyar dike. Hinek zagonên ku dibe qet nehatibin nivîsandin jî lê di nêzîkatiya ji jin re têne pêk anîn. Eger em rewşa Sûriyê têkildarî vê mijarê binirxînin em ê bêjin hemû pirsgirêkên Sûriyê çavkaniya xwe ji vê zîhniyetê û zayendperestiyê digrin.

Ev nebû çend roj 29`ê Kanûnê 2024`an li kolaneke taxa Qidûrbekê ya bajarê Qamişlo mêran li beramberî jinekê xwe birêxistin kirin e. Ew jin ji aliyê mêran ve gunehkar hatiye îlan kirin û derbarê wê de biryara kuştinê dane. Wê çawa û bi destê kî bidin kuştin? Ne balkêşe ku mêr her tiştê jinê bi namûs û şerefê ve bide girêdan, ji ber ev ne cara yekem e. Kî wê namûsa malbatê paqij bike, ya bav, ya bira yan jî kurê ap e. Kurê apê wê jinê li kolanê wê gulbebaran dike, yên derdorê dibihîzin, dibe ku gelek kes dibînin jî lê mesele bûye şeref û namûs, êdî ew jin gunehkar hatiye îlan kirin, wê kesek destwerdan neke. Berevajî; şûna destwerdan bikin, ji wî celadî re dibêjin pêl serê wê bike, spasiya wî dikin û qehreman îlan kirin.

Civak buyerên di bin navê şeref û namûsê de têne kirin, rewa kiriye û mêrên wan jinan dikuje qehreman bi nav dikin. Ev rêbazê kuştina jinê sûcekî siyasî û exlaqî yê mezin e. Bi kuştina jinekê re bi hezaran jinan dikujin. Ji vê kuştina jinan re tê gotin kuştina jiyan û mirovahiyê. Beşek ji jinên Sûriyeyê difikirin ku jin nikarin biçin bihuştê ji ber ew gunehkar in. Ji roja jidayîkbûnê heyanî roja îro bi vî awayî difikirin û di zîhniyeta xwe de israr dikin. Ew jinên ku wisa difikirin qatilên jinan qehreman îlan dikin û wan pîroz dikin.

Ayşe El-Dibis jî yek ji jinên ku hem koleya mêr e hem jî jina ku bi destê mêr teşe girtiye. Ew ê ji mêr zêdetir êrîşî tevgerên jin bike. Ji niha ve dibêje jin dûrî ol û exlaqên civakê ketine û li gorî nêrîna wê divê hemû jinên têkoşer werin terbiye kirin. Êdî Ayşe El-Dibis jî wê qatil û celadên jinan qehreman îlan bike û wan pîroz bike.

Gelê Sûriyeyê sala 2011`an got ew li hemberî sîstema Beşar El-Esed dest bi şoreşê dikin. Ew difikirîn ku bi ketina sîstema Beşar El-Esed wê hemû pirsgirêkên wan çareser bibin. Zayendperestî ji xwe re pirsgirêk nedîtin, berevajî vê yekê Tevgerên Jin ku bi silogana Jin, Jiyan, Azadî dest bi şoreşê kirin, ji xwe re xeter dîtin. Bi vê yekê re hemû komên çeteyan û dewleta Tirk a dagirker her ji destê wan tê êrîşî jinê dikin. Hewl didin ku têkoşîna jin vala derbixînin û dawî li jinê bîn in. Zayendperestî ji bo hemû jinan pirsgirêka herî mezin e. Heyanî ku jin gunehkar têne dîtin wê bi destê mêran werin kuştin û qetilkirin. Ji ber vê yekê gelê Sûrî heyanî ku di zayendperestî û olperestî de israr bike ew ê nikarbe bighîje çareseriyê.



# Ji çiraxên hunera kurdî

**Can Yûsif**


Hunermend Nûhad Yûsif .Xwedan dengekî çiyayî û qirika Botanî. Huner stûneke bingehîn e di avakirin û xurtkirina mirov û şaristaniyan de, ew ne tenê derbirîna bedewiyê ye, herwiha navgîneke bi hêz e di pişkdariya avakirin û belgekirina nasnameya çandî ya netewe û gelan de ye.

Bi rêya hunerê civakan dikarîn bi awayekî kûr têkilî û têgihiştinê çêbikin û di navbera kes û çandên cuda de pir û girêdanên xurt ava bikin, bi saya wê mirov dikarin bîr û ramanên xwe bînin ziman. Hunermendên Kurd bi rêya stran û bijartina helbestên xwe beşdarî parastina nirxên netewa Kurd bûne û bi hunera xwe bûne alîkar ku hewlên qirkirina gelê Kurd pûç bikin û çand, huner û nirxên gelê Kurd di rêya huner û stranên xwe biparêzin, hunermend û stranbêj Nûhad Yûsif yek ji stûnên hunera Kurdî tê hesibandin ku rolek girîng di parastina mîrata çandî û folklorî ya Kurdî de li herêma Cezîrê lehîstiye.

Hunermend û stranbêjê Kurd Nûhad Yûsif li bajarê Dêrikê li Rojavayê Kurdistanê, bajarê helbestvan û hunermendan, yek ji navendên folklor û mîrata kurdî ya resen, di 10/1/1976 de ji du dê û bavên Kurd (Yûsif û Lamaa) hatiye dinê. Ew di nav malbateke kurd a neteweyî û kedkar de ku ji huner û folklora kurdî hez dikir mezinbûye, ku ji 12 zarokan (heft kur û pênc keçan) pêk dihat, û ew yê herî mezine di nav xwişk û birayên xwe de. Dibistana seretayî û amedeyî li bajarê Dêrikê xwendiye û ji ber şert û mercên dijwar ên jiyanê xwendina xwe bi dawî neaniye û hîn di temenê ciwaniya xwe de ji bo alîkariya malbata xwe di ked û karên zehmet de xebitiye.

Meyla wî ya hunerî û hezkirina wî ya ji bo stranên kurdî û folklora kurdî di panzdeh saliya xwe de, di bin bandora bapîrê xwe Husên de, ku stranên resen ên folklorî yên kurdî digotin, dest pê kiriye. Wî şiyana(hinêra) xwe ya hunerî zêdetir pêşxiste bi ezberkirina gelek stranên gelêrî yên folklorê Kurdî û di bin bandora dengbêjên mezin ên Kurd ên herêmê mîna (Ebdulezîz Simê, Îbrahîm Bane Qesrî, Reşîd Elanê û Mela Xelîl) de ma ye. Hunermend Nûhad Yûsif di 01.03.1997ê de zewicî û çar kurên wî hene.

Di sala 1998’an de dest bi hengama (mesîre) xwe ya hunerî ya stranbêjî û dengbêjiyê di dawet, şahî û ahengên neteweyî de kiriye. Di sala 2001’ê de ligel komek hunermendên Dêrikê wek (Ednan bavê Hêco, Zîdan Şêx Qasim, Rakan Elanê, Seîd Ebdulbaqî û orkestravan Yakan Bellî) Koma Evîn damezrandine ji bo vejandina aheng û dawetên gelêrî li herêmê. Di sala 2003’an de, wî koma xwe ya taybet damezrand,wek hunermendek serbixwe, ji bo pîrozkirina dawet, şahî û helkeftên neteweyî, ku di nav gelê Kurd de li parêzgeha Hesekê deng veda. Hunermend Nûhad Yûsif yek ji pêşengên strana gelêrî ya kurdî li herêma Dêrikê tê naskirin, ew gelekî nêzîkî hunermend Ednan bavê Hêco bû, ji ber ku wî alîkarî bi wî re kir ku kesayetiya xwe ya hunerî ava bike û gelek stranên xweş û awazên şêrîn pêşkêşî wî kirin.



Hunermend Nûhad Yûsif her wiha di xebata xwe ya hunerî de bal kişandiye ser ezberkirina gelek stranên gelêrî yên resen ên Kurdî, ku yek ji zehmettirîn şêweyên strana gelêrî ne, wek (Peyîzok ,Bûlîte, Heyranok, Lavij, û Serûlî).

Di destpêka gerîna xwe ya di cîhana muzîk û dengbêjiyê de rastî gelek zehmetî û astengiyan hat, lê wî karî li hember wan raweste û rêya xwe bişopîne bi îrade û viyana xwe ya xurt .Ji ber helwestên wî yên neteweyî, ew ligel hunermend Cemal Sadûn û mûzîkjen Dijwar Ebdullah ji aliyê desthilata ewlekariya Sûriyê ve hat girtin, bi buhaneya ku wî di daweteke li Dêrik ê de di 4’ê cotmeha 2009’ê de stranên niştimanî pêşkêş kirine, du mehan em li gel hev man di heman qawîşê de li zindana Elaya de.

Ew rastî gef û îşkenceyê hat, lê teslîm nebû, ne jî serî li ber fermanên ewlehiyê daxist, wî karê xwe yê hunerî berdewam kir û gelek stranên rengereng derxistin. Ji kar û berhemên wî yên hunerî sê albomên stranên folklorî, evîndarî û niştimanperwerî hene. Di sala 1999’an de yekem alboma xwe bi navê (Wey li min dunyayê) derxist û alboma wî ya duyemîn di 2001’an de bi koma Evîn re derxist. Alboma wî ya sêyem di sala 2009’an de derketiye û her albomek ji 12 stranên folklorîk, evîndarî û welatparêzî pêk tê. Piraniya stranên wî ji gotin û awazên wî, û awaz û peyvên hunermend Ednan bavê Hêco û hin hunermend û helbestvanên herêmê ne, wek (Melayê Cezîrî, Diljan Cûdî bavê Ceger, Şevger Mîrza, Melevan Resûl, Cuma Êrisî, Îbrahîm Cangîr, Leşker Bane Qesrî, Dewran Bane Qesrî û Rêzan Şêxo, Ridwan Xorsî û Xalid Mela) ne.

Di nav van stranan de yên herî navdar ev in:

1-Cejna Evînê :Gotin Diljan Cûdî -awaz bavê Hêco.
2-Xanim Xanim : Gotin û awazên bavê Hêco.
3- Zariya gunde: Gotin û awazên Leşker Bane Qesrî
4- Hene hene hinda Şîrînin:Gotin û awazên Ridwan Xorsî.
5-Îro ez bûme Ixtiyar:Gotin û awazên Dewran Bane Qesrî.
6-Ka Tu Bêje : Gotin û awazên Rêzan Şêxo
7-Bi xêr hatî dalala min :Gotin Xalid Mela û awaz bavê Hêco.
8-Riweyda: Gotin û awazên Cuma Êrsî.
9-Bûkê : Gotin Îbrahîm Cangîr, awaz Nûhad Yûsif.
10- Evîna min : Gotin û awazên Şevger Mîrza.
11-Vê Firqetê : Gotin Melayê Cezîrî û awaz bavê Hêco.
12- Anisê: Gotin Melevan Resûl, awaz Bavê Hêco.

Ji bilî vê jî, herwiha wî car bi car stranên takekesî diweşandin

Wî herwiha di van demên dawî de çend vîdyo klîp jî weşandin, di nav de:

1-Dayê: Peyv û awazên Ednan bavê Hêco
2- Xanim Xanim: Gotin û awazên Ednan bavê Hêco
3- Lê Lê Kinê: Gotin û awazên folklora kurdî.
4- Ey dinyayê : Peyv û awazên Ednan bavê Hêco
5- Cejna Evînê: Gotin Diljan Cûdî û awaz bavê Hêco.
6- Kanîka Binya Mala: Gotin û awazên folklora kurdî
7- Li min : Gotin û awazên folklora kurdî
8- Siwaro: Gotin û awazên folklora kurdî
9-Kuro Malî: Gotin û awazên folklora kurdî
10-Min bêjinga xwe hejand: Peyv û awazên Nûhad Yûsif
11-Ew Xanim: Gotin û awazên Ednan bavê Hêco
12-Hin hene hinde Şêrînin : Peyv û awazên Ridwan Xorsî.

Nûhad Yûsif dengbêjekî Kurd ê gelekî navdar e, belkî tişta ku vî hunermendî ji hev cuda dike ew e ku jêhatîbûna wî ya mezin di pêşkêşkirina stranan de bi awayekî ku dilan xweş dike û hestan geş dike. Şarezariya wî ya hunerî tenê bi stranbêjiyê re sînordar nema, ji ber ku wî ji bo gelek stranên xwe awaz çêkirin û gotin nivîsandin û xwe fêrî lêxistina ûdê kir.

Ji stranên wî yên taybet yên herî navdar :

1-Ez Poşmanim.
2-Bes xwe bihejîne.
3-Dêrik çi xweşe.
4-Kejê faye tê.
5-Gundê me bi dare.
6-Min û dilê xwe.
7- Mihemed Beg.
8- Yadê çi xweşe navê te.
9-Cîrana min.
10-Dilbera mê Kew.
11-Yar mişmişe
12-Niqşa li ser dilê min .

Hunermend Nûhad Yûsif di gel hêjmarek hunermendên Dêrikê çend stran bi rengê kom û duet pêşkêşkirine, wekî:

1- Strana “Dêrik Dayika Mine ” ji bo sersaxiya hunermend Cemal Sadûn.
2-Strana “Ey Rojava” ji gotnê Diljan Cûdî “bavê Ceger” û awazê bavê Hêco.

Her wiha ligel hunermend Rojda Haco ew beşdarî di strana (Dilberê Îro Seher) de bûye ji gotinê melayê Cezîrî û awazê Nûhad Yûsif. Hunermend Nûhad Yûsif yek ji qurbaniyên serjimêriya nerewa bû ku di sala 1962’an de li parêzgeha Hesekê li Kurdistana Sûriyê pêk hat û tê de bi sed hezaran Kurd ji hemwelatiya Sûriyê bêpar man, û heta îro jî bê belge maye. Ji ber şert û mercên şer, wêranî û kuştinên ku Sûriyê tê re derbas bû û têkçûna ewlekarî, ewlehî û aramiya herêmê ji ber êrîşên komên çekdar û hêzên tarî (DAIŞ û Cebhet El-Nusra) li ser herêmên Rojava û wêrankirina binesaziyên welat, ew di dawiya sala 2012’an de neçar ma ku bajarê xwe Dêrikê terk bike û derbasî Ewropayê bibe û di gel malbata xwe li Danîmarkayê bi cih bû ye. Ji sala 2018’an û vir ve ji ber rewşa xwe ya tenduristî dev ji şahî û dawet, aheng û helkeftên netewî berdaye û di van demên dawî de jiyana xwe terxan kiriye ji bo berhevkirina stranên gelêrî yên kurdî, ezberkirina wan û parastina wan ji windabûnê û dem bi dem weşandina hin klîb û stranên folklorî û hunerî yên kurdî dike.

Hunermend Nûhad Yûsif bi dengê xwe yê çiyayî ku hemû guh û çêjan şa dike navdar e, wî bi stranên xwe yên folklorîk deng daye heta ku bûye yek ji hunermendên kurd ên herî girîng li Sûriyê û gelek stranên kurdî yên netewî, folklorî û dildarî pêşkêş kirine.

Bi stranên xwe yên hêja hunera Kurdî dewlemend kiriye, ez jê re saxlemî, serkeftin û afirîneriya zêdetir dixwazim û ku zû vegere li şahî û dawetan.

## Têbînî



### Rewşenbîr û yekrêziya tevgera kurdî

**Kemal Necim**

Di demên dawî de mijara yekîtiya neteweyî, yan jî weke tê binavkirin yekrêziya tevgera siyasî ya kurdî ketiye rojeva kurdên Rojavayê kurdistanê. Her çiqas ev mijar bi salan e di rojevê de û weke daxwazeke civakî û cemawerî bû, lê piştî geşedanên lezgîn ên li Sûriyeyê rû dan, ev mijar êdî bûye pêdiviyeke jiyanî ya girîng ku siberoja kurdan li vî welatî destnîşan bike.

Gelek hewildan heta niha çêbûne, lê carê di nava vê liv û tevgerê de behsa rola rewşenbîran tê kirin. Ango ka rewşenbîr ji bo pêkanîna yekîtiya tevgera krudî dikarin çi bikin yan çi kirine.

Gelek derdor û kesayetên rewşenbîrî hewl didin vê valehiyê dagrin an jî bersiva vê pirsê bidin, lê di baweriya min de reftareke şaş dikin û tiştekî ji reftara giştî cudatir nakin. Ew derdor di wê baweriyê dene ku erka wan ew e çend rewşenbîr yan çend sazî xwe bidin ser hev û herin serdana navend û ofîsên partî û rêxistinan û derbarê girîngiya yekîtiyê de hin şîreta li wan bikin belkî bêne ser hişê xwe û nêzî hev bibin. Ji xwe hemû rewşenbîr û dezgehên rewşenbîran jî derbarê mijara yekrêziyê de ne hemfikir in, her wiha tevgera rewşenbîrî jî têra xwe belav û parçebûyî ye, lewma şîretên wan jî pir caran li ber bayê diçin. Bê guman mijara yekirin yan jî yekrêziya helwesta tevgera siyasî ya kurdî mijareke siyasî ye, heta niha bi şîret û fişar û helbestan çênebûye. Li vir divê rewşenbîr rola xwe ya resteqîn nas bike û li gorî wê tevbigere.

Tê zanîn ku netew hebûna xwe weke netew bi çanda xwe diparêzin, çanda netewan çi ye? Ew nirxên hevbeş ên neteweyê ne, nirxên ku bi partiyan û tvgerên siyasî û sînoran nayê parçekirin, weke dîrok, ziman, nasname û xwebûnê. Ev nirx hemû hişmendî û kesayeta çandî ya neteweyê ava dikin. Ev nirx ew mertala netewan e li hember hemû astengî û arîşeyan, bi van nirxan netew dikarin hebûna xwe û axa xwe biparêzin.

Lewma dema ku behsa parçebûn û belavbûna tevgera siyasî ya kurdan dikin, em behsa qelsî û lawaziya van nirxan dikin, behsa lawaziya hişmendiya neteweyî dikin. Ji ber ku di rewşeke asayî de li erdnîgariyeke teng û civakeke hin din weke ya rojava de, hebûna bi dehan partî û rêxistinên siyasî nexweşiyeke mezin e û bêhişiyeke şerm e. Ev nexweşî ne tenê ya wan kesên ku wan partiyên lawaz ava dikin e, her wiha nexweşiya civakê ye jî ku bi hêsanî dikare rewşeke wiha bipejirîne û di nav de jiyan bike.

Tişta ku pêwîste rewşenbîr berê xwe bidinê ew lawazî bi xwe ye, divê wê valehiyê û lawaziyê dagrin. Bi helwest, reftar, raman û çalakiya xwe her wan nirx û hişmendiyan di nava civakan de biçînin û belav bikin. Di vê mijarê de qada rewşenbîran ya sereke qada raman û hişmendiyê ye. Pêwîst e bi alîkariya dezgehên ragihandinê û perwerdeyê herikîneke raman, hişmendî û çanda neteweyî pêk bînin. Çek û hêza herî mezin ya pêkanîna yekrêziya netewî hişmendî, raman û çand e.

# Rêber Apo sembola azadiya gelê kurd e

Endamê Komîteya Lihevanînê ya kantona Cizîrê Nûredîn Şakir diyar kir ku pêngava azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ku di 10'ê Cotmeha 2023'an dest pê kiribû li ser raya giştî û li giştî cîhanê bandoreke erênî kir, li çar parçê Kurdistanê û di cîhanê de Rêber Apo wek sembola azadiyê tê dîtin.

**Amara Baran/Qamîşlo**

Fikir û felsefeya Rêber Apo di Rojhilata Navîn de ji bo gelê kurd bû hêvî û li cîhanê deng veda. Di vê çarçoveyê de endamê Komîteya Lihevanînê a Herema Cizîrê Nûredîn Şakir ji Rojnameya me re axivî.

**'Gelê kurd li derdora fikir û felsefeya Rêber Apo kom dibe'**

Nûredîn destnîşan kir ku pêngava azadiya fîzîkî a Rêber Apo bi pêşengtiya dostên Rêber Apo û bi yekîtiya gelê kurd û welatparêzan hat destpêkirin û wiha got: "Pêngava azadiya fîzîkî a Rêber Apo ku di 10 Cotmeha 2023'an de hatibû destpêkirin bandorekî erenî li ser raya giştî û cîhanî kir. Di Kurdistanê de cara yekeme ku gelê kurd li ser asta netewî li derdora fikir û felsefa Rêber Apo kombûn. Bi saya fikrê Rêber Apo doza gelê kurd hat naskirin û doza gelê kurd li ser asta cîhanî bû doza yekemîn ku îro 50 mîlyon kurd banga doza xwe dikin, doza gelê kurd hertim ji aliyê dewletên desthilatdar ve hatiye înkarkirin, taybet dewleta tirk a ku ev 26 salin Rêber Apo di zîndanê de digre daku gelê kurd



ji doza wî dûr bixe."

**'Rêber Apo 26 salin li Îmraliyê tekoşînê dike'**

Nûredîn bi bîrxist ku di Rojhilata Navîn û cîhanê de Rêber Apo wek sembola azadiya gel tê dîtin. Ev 26 salin gelê kurd di hemû çalakiyan de li kolanan banga azadiya fîzîkî a Rêber Apo dike. Û wiha domand: "Gelek zanyar, siyasetmedar, feylezof û rewşenbîrên cîhanî û rewşenbîrên Ereb jî di nav de dewa azadiya fîzîkî a Rêber Apo dikin. Pêwîste were dîtin ku doza gelê kurd Gîhaştıye qonaxeke nû taybet em weke gelê kurd vî yekê bibinin û sûd jê bigrin. Gelê kurd kurdistaneke bi fikir û felsefeya Rêber Apo dixwaze ku ev 26 salin Rêber Apo li girtîgeha îmraliyê de ji bo gelê kurd tekoşîn dike bi dîl girtinekî gihaşte afrîneriyekî ku di nava cîhanê de bi fikir û felsefeya wî doza gelê kurd hate naskirin. Ji bo wî hemû rewşenbîrên dûnyayê li dora gelê kurd kombûye. Em wek gelê kurd deyndarê Rêber Apo ne ku me heta niha nekariye azadiya wî ya fîzîkî pêk bînin."

**'Rêber Apo hêza fikir û îradeyê ye'**

Nûredîn wiha domand: "Dewleta tirk a qirker û metînger 5 salên dawî li îmraliyê tecrîda mutlaq dimeşand. Hevdîtina herê dawiyê di Tebaxa 2019'an de pêk hat ji wî deme heta niha hevdîtin nehatibûn çêkirin. Ev hevdîtin di şert û mercên giran de pêk hat. Rêber Apo bi peyamên xwe rojev diyar kir, eger tecrîd bi temamî bê rakirin şert û mercên tendûristî, ewlehî û xebatê a ji bo Rêber Apo pêk werin wê pêvajo bi fikrin Rêber Apo pêş bikeve. Yekane çareseriya îradeya pirsa kurd û derketina ji qaûsa rojhilata navîn Rêber Apo ye. Tene bi hêza Rêber Apo acax ji pirsgirêkan re çareserî were dîtin. Yên ku ji hişmendiya azadiyê durin û Rêber Apo nasnakin nikarin vî rastiyê nasbikin, gelê rojhilata navîn ji baş dizane ku Rêber Apo hêza fikir û îradeyê ye. Pekhateyên ku li bakur û rojhilatê suriyê jiyan dikin rêveberiya xweser û fikre Rêber Apo wekê mînakê çareseriya, çareseriya rojhilata navîn û suriyê de dibînin. Ji bo gelê kurd ev gaveke pîroze ku pêkhate û gelêdin jî dixwazin azadiya xwe û rizgariya xwe di fikir û felsefeya Rêber Apo de dibînin. Di rojhilata navîn de diyar dibe ku kurd bûne cîhê çareseriyê wezna xwe ya siyasî û civakî li ser bingeha fikir û felsefeya Rêber Apo a ku li ser biratiya gelan û netewa demokratîk hatiye avakirin."




**'Dewleta tirk hebûna xwe di tunekirina kurdan de dibîne'**

Nûredîn wiha domand "Dewleta Tirk wekê her demê li pêşiya pêşketinên kurdan dibe asteng ji ber ku ji hebûna gelê kurd ditirse û ji xwe re wek xeterî dibîne, ew hebûna xwe di tunekirina kurdan de dibîne. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê gel tehdît dike dibêje" an kurd sîlehên xwe daynin an jî bi tevê sîlehên xwe wê bin ax bibin", bi wî fikre şofînîst û nîjadperest biratî ya gelan tune dike. dewleta tirk jî vî baş dizane ku gelê kurd nema tehamûla desthilatdariyê dike û nîjadperestiyê nema qebûl dike, gelê kurd pir aşkare ji dewleta tirk re dibêje ku " Rêber Apo rûmet û hêzame ye menewî fikrî û felsefi û ehlaqê civakê bime da naskirin" pêwîste dewleta tirk a dagirker lixwe vegere pirsgirêkên ku niha bê çareserî mane hemû jî girêdayê azadiya Rêber Apo ne, ger ev pêk neyê şer û pêvçûnên ku di navxweyîde derkevin wê qetlîamên nû bixwere bîne ne tene kurd wê gelên ku li heremên dijîn bi qetlîaman re rû bir û bimînî"

# 'Pêwîste hêzên navneteweyî û rêxistinên mirovî bi erkê xwe rabin'

**Dîlan Mulhim/ Qamişlo**

**Berdevka Rêxistina Sara ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Arzo Temo diyar kir ku jin pêşenga civakê ye , ji ber wê hertm dibe hedefa çeteyên wê û wiha got: "Pêwîste hêz û rêxistinên navnetewî û rêxistinên mirovî bi erkê xwe rabin li hemberî van kiryarên ku di derhexê jinan de têkirin.**

Komeleya Sara a Têkoşîna li dijî tundiya li ser jinan di sala 2013'an de li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li bajarê Qamişlo hat damezrandin. Komeleya Sara ji destpêka damezrandinê ve û heta niha li dijî tundiya li ser jinan têkoşînê dike, herwiha ji bo bihêzkirina jinan di warê siyasî, aborî û civakî de gelek kar û xebat kirin e. Di heman çarçoveyê de bi awayekî aktîv semîner û çalakiyan li dar dixe.

Di derbarê kuştin û hedefkirina jinan li herêmên dagirkirî, berdevka Rêxistina Sara a Bakur û Rojhilatê Suriyê Arzo Temo ji rojnameya me re axivî.

**'Dewleta Tirk di êrişên xwe de bi taybet jinan dike hedef'**

Arzo Temo anî ziman ku di êrişên dawî de li ser Minbic, Şehbayê û Tilrifhetê bi taybet jin hatin hedefgirtin û wiha got: "Dewleta Tirk a dagirker di êrişê xwe yê li ser herêma Bakur û Rojhilatê Suriyê de jin û zarokan dike armanc. Herwiha ji sala 2011' an heta niha êrişên dewleta Tirk li ser herêma Bakur û Rojhilatê Suriyê ne hatiye rawestandin. Di heman demê de şoreşa Rojava bi jinê hat naskirin, ji ber vê yekê jin di her qadê de cihê xwe girt û bû pêşenga civakê. Jin civak birêvebe û birêxistin kir û bi taybet jin birêvebir, jin nîvê civakê û nîvê civakê û nîvê din kedî dike. Ji ber vê yekê dewleta Tirk dixwazê ku civakê tunebike, ji ber vê yekê jina birengekî hovane dike armanc .Di van êrişên dawî li ser Şêx Meqsûdê ji aliyê çeteyên girêdayî dewleta Tirk ve du jinên hêzên parstina Şêx Meqsûd, hatin girtin û çeteyan ew birin cihekî ne diyar heta dema niha agahiyên me li ser va her du jinan nînin."

**'Nameyên me ji bo bêdengiya mafê mirovan hene'**

Arzo Temo da zanîn ku sê endamên jin li bajarê Minbicê ji aliyê çetan ve hatin qetilkirin û wiha şîrovekir: "Li bajarê Minbicê 3 jinên ku di saziyên sivîl de kar dikirin ji aliyê çeteyên girêdayî dewleta Tirk ve hatin şehîdxistin. Di vê demê de bi hezarên jinan tên hedefgiritin, û zarokên bi temen biçûk tên tecawizkirin û bi taybet li herêmên ku ji aliyê çetan ve hatine dagirkirin. Di bin navê ku wan xwe kuştiye û pêwîste ev sûcê di derhetê jinan de tê kirin bê rawestandin , herwiha ji bo van kiryarên di derhetê jinan ji sala 2011' an de heta dema niha berdewamin ,sûjên di derheqê jinan de tê kirin ji aliyê çeteyê girêdayî dewleta Tirk li hermên dagikirî . Me gelek name ji bo bêdengiya mafê mirovan amede kirine û pêwîste mafê mirovan li hemberî van binpêkirina ku derheqê jinan de têkirin, helwesta xwe nîşan bidin."

**'Banga me ji bo hêzên navnetewî û rêxistinên mirovî heye ku bi erkê xwe rabin'**

Berdevka Rêxistina Sara ya Bakur



û Rojhilatê Sûriyê Arzo Temo axftina xwe wiha bi dawî kir: " Bangewaziya me ji rêxistinê navnetewî ên ku mafê jinan biparêzin heye ku bi erkê xwe rabin. Li dijî van binpêkirinê,kuştin û hedefgirtin ku li ser jinan û zarokan tên kirin ji aliyê çeteyên girêdayî dewleta Tirk pêwîste helwesta nîşan bidin û bi erkê xwe rabin. Lê bixamin heta dema niha dewletên navnetewî û rêxistinên mafê mirovan li hemberî van sucên di derhekê jin kurde tên kirin bê dengin. Em bi hêvîn dewletên navnetewî û rêxistinên mirovî bi erkê xwe rabin."



# Milîtanên pêşeng ên Ragihandina Azad

Hevserokê Ragihandina Azad Dilyar Cizîrî diyar kir ku ew ê hertim xwedî li nirxên rojnemevanên şehîd derkevin, rêya wan ya şopandina heqîqetê dewam bikin û wiha got: "Tu carî pênûs û kamîreya şehîdên me li erdê namîne û wê xeta ragihandina azad misoger berdewam bibe."

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

Di derbarê hedefgirtina dewleta Tirk a dagirker ji rojemevanên ragihandina azad re Hevserokê Ragihandina Azad Dilyar Cizîrî bersiva pirsên rojnameya me da, hevpeyvîn wiha bû:

**-Ji destpêka Şoreşa Rojava ve heta roja îro hijmara rojnemevanên ji milê dewleta Tirk ve hatine hedefgirtin çiqasin û armanc ji hedefgirtina wan çi ye?**

Dewleta Tirk a dagirker ji destpêka şoreşa 19'ê Tîrmehê ve bê navber êrişî hemû qadan dike, çi civakî, leşkerî, siyasî, aborî û ragihandinê jî. Di vê çarçovê de gelek rojnemevan ku şopdarên heqîqet û dengê civakê bûn şehîd ketin. Armanca dewleta Tirk ew e ku siyaset û pilanên xwe li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûrî ferzbike û dengê civakê tune bike. Ji destpêka şoreşê ve heya roja îro 30 rojnemevanên ku dixwestin vê siyaseta qirêj a dagirkeriyê ragihînin bûn hedef ji dagirkeriyê re û gihan asta şehadetê. Di heman demê de gelek rojnemevan birîndar bûne.

Ev siyaseta dagirkeriye Tirk ne tesadufî ye, ji ber ku navenda wan ya şerê taybet li ser ragihandinê tê meşandin. Her wiha wek ku tê dîtin jî rojane bi dehan nûçeyên derew li ser malperan tên belav kirin û dixwazin vîn û baweriya gel bişkînên, lê kesên ku li beramberî wan wek bend disekine ragihandina azade, loma hertim ragihandina azad hedef digrin.

**-Wek dezgehên ragihandinê li Bakur û Rojhilatê Sûrî li hemberî qetilkirina rojnemevanan çi kar û xebat hatiye kirin û di demên pêş de wê çi were kirin?**

Tişta ku di serî de hatiye kirin ew xwedî derketina li nirxên rojnemevanên şehîd, şopandina û berdewamkirina riya heqîetê. Her çiqasî jî dagirkerî rojnemevanan şehîd bixin jî, tu carî pênûs û kamîreya wan li erdê namîne û wê xeta ragihandina azad misoger berdewam bibe û wê riya rastiyê berdewam bibe. Ji ber vê yekê jî em vê wek xaleke bingehîn dibînin ji bo ked û têkoşîna xwe, di heman demê de ji bo kirinên xwe yên li beramberî êrişên dagirkeriyê ku gelên me û xebatkarên çapemeniyê dike armanc. Şerê ragihandinê ji şerê leşkerî bandortire, lewoma



dewleta dagirker dixwaze bi riya wê re bandorê li gelê herêmê bike û pirojeya netewa demokratîk û biratiya gelan têk bibe. Dema mirov xwedî li vî nirxî derkefe ew kirina herî guncawe û dikare pilanên dijmin jî vala derxe, li kêlek wê jî belgekirina sûcên dewleta Tirk tê kirin, parvekirina van sûcan ji raya giştî re û saziyên eleqedar bi parastina rojnemevanan re ev yek jî xebateke û tê meşandin. belgekirin û nîşandana sûcdaran ew jî weke erkekiye û li ser milê me ye û pêwîste were şopandin û pêkanîn. Di demên bê de pêwîste hîn zêdetir em xwedî li nirxên şehîdên xwe derkevin û layîqî ked û têkoşîna wan bin, divê em vê xebatê hîn zêdetir mezin bikin û li beramberî êrişên dewleta Tirk li ser qada ragihandinê bibin bend û artêşên wan ên elekitronîk vala derxin. Di heman demê de bandorekî li ser raya giştî ya cîhanê de bikin. Encamên vê yekî îro roj jî tên dîtin ku çawa dewleta dagirker û çeteyên xwe dixwazin nûçeyên derew ragihînin lê raya giştî ya Bakur û Rojhilatê Sûrî û ya cîhanî ji van nûçeyan bawer nakin. Divê em têkoşîna xwe xurtir bikin ji ber ku li Bakur û Rojhilatê Sûrî xeta ragihandina azad, xeteke ku cihê baweriya civakî ye. Civaka me ragihandina azad wek çavkaniya sereke digre, ev yek ji bo me şenseke ku em karibin hîn zêdetir bandora xwe mezin bikin. Têkiliyên ku xebatkarên ragihandina azad avakirine bi sazî û dezgehên ji derve re ew jî roleke wan a mezin heye.

**- Erk û berpirsiyariya rojnemevanan li hemberî qetilkirina rojnemevanan ji aliyê dewleta Tirk ve çi ye?**

Dewleta Tirk a dagirker şerekî mezin ê ragihandinê dide meşandin û hemû hêz û hewildanên xwe dike ku bi riya ragihandinê re rastiyê berûvajî bike û raya giştî ya civakê li gorî xwe avabikin. Entîpiropogendayan belav dikin ji bo derxistina tevlîheviyê di navbera pêkhateyan de. Ji ber ku hêmanê bingehîn ê serkeftina Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrî û hêza wê ya leşkerî li ser hevgirtina civakê û biratiya gelan hatiye avakirin. Ji ber vê yekê ew lingê sereke yê Rêveberiya Xweser esas digre. Li kêleka wê jî dewletên din jî piştigiriyê didin dewleta Tirk di van mijaran de bi taybet Qeter. Lewma Erk û berpirsyarbûna rojnemevanan di vê demê de bi taybet jî rojnemevanên xeta çapemeniya azad erka sereke ew e ku hêz û mezinbûna biratiya gelan û jiyana hevbeş a di vê herêmê de esas bigre û biparêze. Pêwîste em kar û xebatên xwe bidomînin û em nehêlin dewleta Tirk tevlîheviyê bixwe di navbera pêkhateyan de. Heta niha gavên pîroz hatine avêtin, lê hîn jî têrê nake divê em xurtir bikin. Çawa ku şervanên me berxwedaniyeke mezin didin meşandin û derbên giran li çeteyan dixin, pêwîstî heye ku em jî derbeyên giran li pîlan û siyasetên wan bixin.

**Nav, dîrok û cihê ku rojemevanên çapemeniya azad lê şehîd bûne wiha ne:**

-Mazlûm Bagok (Ehmed Sedo) sala 1992'yan li bajarê Qamişlo ji dayik bûye. Ew yekemîn rojnamevanê şehîd ê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye. Di şopandina hemleya vekirina korîdora mirovî di navbera Rojavayê Kurdistanê û Şengalê de di 28'ê Îlona 2014'an de şehîd bû.
-Rêwan Zagros (Kadar Xelef) endamê Ragihandina Yekîneyên Parastina Gel (YPG) di şopandina berxwedana YPG'ê ya li gundê Filistîn ê bajarokê Ceza yê kantona Cizîrê de, di 21'ê Çileya 2014'an de şehîd bû.
-Bahoz Horan li Kobanê ji dayik bûye û di şopandina hemleya rizgarkirina bajarê Kobanê ji çeteyên DAIŞ'ê de 1'ê Kanûna 2015'an şehîd bû.
-Agirî Yilmaz (Meryem Mihemed) di 1995'an de li Reqayê ji dayik bûye. Di şopandina hemleya rizgarkirina bajarê Kobanê ji çeteyên DAIŞ'ê de li gundê Xan Mamed di 13'ê Nîsana 2013'an de şehîd bû.
-Arîn Cûdî (Ahîn Fayiq Îbrahîm) ji gundê Maşûq ê Tirbespiyê ye û di 1996'an ji dayik bûye, di 2016'an de dema li ser karê xwe yê rojnamegeriyê bû mayînek li herêma Holê ya Hesekê teqiya û şehîd bû.
-Aram Can (Aram Mihemed Ebdullah) endamê Ragihandina YPG'ê bû. Di şopandina hemleya rizgarkirina Minbicê ji çeteyên DAIŞ'ê, di 2'yê Hezîrana 2016'an de şehîd bû.
-Mustefa Mihemed Şukrî di 1987'an de li navçeya Girê Spî ya dagirkirî ji dayik bûye. Ew nûçegihanê kanala Ronahî TV bû û di şopandina hemleya rizgarkirina Minbicê di 19'ê Tîrmeha 2016'an de şehîd bû.
-Rustem Çîlo (Selah Sîdo) endamê Ragihandina YPG'ê bû û di topbarana dewleta Tirk a dagirker li dijî herêmên Şehbayê de di Mijdara 2016'an de şehîd bû.
-Eylûl Nûhilat (Ronahî Omer) endama Ragihandina Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) bû û di şopandina hemleya rizgarkirina gundewarê Şehbayê de di 20'ê Mijdara 2016'an de şehîd bû.
-Mihemed Aksoy (Firas Dag) ji navçeya Elbîstanê ya Mereşê ya Bakurê Kurdistanê ye. Endamê Ragihandina YPG'ê bû û di êrişa çeteyên DAIŞ'ê de li dijî nuqteyên YPG'ê di hemleya Bagera Cizîrê de di 26'ê Îlona 2017'an de şehîd bû.
-Xerîb Welat (Xerîb Reşo) yek ji damezirînerên Ragihandina YPG'ê bû. Di 1996'an de li gundê Sînka yê Efrîna dagirkirî ji dayik bûye. Di şopandina hemleya Xezeba Firatê ya rizgarkirina Reqayê de di 21'ê Nîsana 2017'an de şehîd bû.
-Rêwan Gênco (Ehmed Hesen Hemo) ji gundê Beyandor ê navçeya Tirbespiyê ye. Endamê Ragihandina YPG'ê bû û di topbarana li dijî gundê Qereçox ê bajarê Dêrikê de di 25'ê Nîsana 2017'an de şehîd bû.
-Heqî Bagok (Celal Hesen) di 1988'an de li gundê Etbê yê Tirbespiyê ji dayik bûye û di topbarana dewleta Tirk a dagirker li dijî çiyayê Qereçoxê de di 25'ê Nîsana 2017'an de şehîd bû.
-Şîlan Botan (Rîm Xeşman) ji navçeya Dêrikê ye û di topbarana dewleta Tirk a dagirker li dijî çiyayê Qereçox de di 25'ê Nîsana 2017'an de şehîd bû.
-Dilîşan Îbiş nûçegihana Ajansa Nûçeyan a Hawar (ANHA) ye û di 1991'an de li Kobanê ji dayik bûye û di êrişeke xwekuj a çeteyên DAIŞ'ê li rojhilatê çemê Firatê de di 12'ê Cotmeha 2017'an de şehîd bû.
-Hogir Mihemed nûçegihanê ANHA'yê ji bajarê Qamişlo ye. Di êrişeke xwekuj a çeteyên DAIŞ'ê li rojhilatê çemê Firatê de di 12'ê Cotmeha 2017'an de şehîd bû.
-Rizgar Adanmiş (Rizgar Deniz) nûçegihanê ANHA'yê ye û di şopandina hemleya gundewarê Dêrazorê de di 20'ê Çileya 2017'an de şehîd bû.
-Tolhildan Welat (Ocalan Ehmed) rojnamevanê YPG'ê ji Efrînê ye. Di Berxwedana Serdemê de di 23'yê Kanûna 2018'an de şehîd bû.
-Îsmaîl Xelîl, rojnamevanê Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê û di 29'ê Kanûna 2018'an de şehîd bû.
-Rohenda Efrîn, endama Ragihandina YPJ'ê di Berxwedana Serdemê de li Cindirêsê di 2018'an de şehîd bû.
-Seid Mihemed Seîd Şêxmûs El Ehmed, nûçegihanê ANHA'yê ji navçeya Til Temirê ye. Di topbarana dewleta Tirk a dagirker de dema şopandina mertalên mirovîn yên ku diçûn Serêkaniyê di 13'ê Cotmeha 2019'an de şehîd bû.
-Mihemed Hisên Reşo nûçegihanê kanala Çira TV ye û ji Efrînê ye. Di şopandina mertalên mirovî yên ku diçûn Serêkaniyê de di 13'ê Cotmeha 2019'an de şehîd bû.
-Dilovan Gever (Dîlan Olmaz) ji herêma Geverê ya Bakurê Kurdistanê ye. Di belgekirina êrişên dewleta Tirk a dagirker li dijî gundên Girê Spî de di 13'ê Cotmeha 2019'an de şehîd bû.
-Welat (Widad Erdemci) ji Bakurê Kurdistanê ye, di topbarana dewleta Tirk a dagirker li dijî Serêkaniyê de di 10'ê Cotmeha 2019'an de şehîd bû.
-Zîzis Sînke, karmendê ragihandina Frî Bor Marincir e, di topbarana dewleta Tirk a dagirker li dijî Til Temirê de, di 2019'an de şehîd bû.
- Îsam Ebdullah, nûçegihanê ANHA'yê ye, ji bajarê Dêrikê ye. Di şopandina topbarana dewleta Tirk a dagirker li dijî gundê Teqilbeqilê yê navçeya Dêrikê de di 20'ê Mijdara 2022'yan de şehîd bû.
-Necmedîn Feysel El Hac Sînan, karmendê kanala Jin TV di êrişa balafira bêmirov a dewleta Tirk a dagirker li ser rêya Qamişlo – Amûdê di 23'yê Tebaxa 2023'yan de şehîd bû.
-Seyid Evran, rojnamevan û nivîskarê şoreşger, di 22'yê Îlona 2023'yan de ji ber nexweşiya dil şehîd bû.
-Cîhan Bîlgîn; Nûçegihana ajansa ANHA sala 1996'an li navçeya Midyad a bajarê Mêrdînê yê Bakurê Kurdistanê hatiye dinê. Cîhan Bîlgîn 19'ê Kanûna îsal dema ku êrişên dewlata Tirk a dagirker ên li ser Bendava Tişrînê dişopandin, di encama êrişa balafireke bêmirov û biçek a dagirkeran de şehîd bû.
-Nazim Daştan; Sala 1992'yan li navçeya Giyadîn a bajarê Agirî yê Bakurê Kurdistanê ji dayik bûye. 19'ê Berfanbara îsal de dema ku êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Bendava Tişrînê dişopandin, di encama êrişa balafireke bêmirov û biçek a dagirkeran de şehîd bû.

# Dewleta Tirk dixwaze li Bakur û Rojhilatê Sûriyê DAIŞ' ê nûjen bike'

Hevserokê Kongra Islama Demokratîk Ebdulkerîm Saroxan diyar kir ku piştî têkçûna rêjîma Baas, dewleta Tirk û hevkarên wê dixwazin bi nûjenkirina DAIŞ'ê re armanca xwe ya dagirkirina axa Sûriyê pêk bînin û berjewendiyên xwe bidest bixin.

**Tekoşîn Amara/ Qamişlo**

Hedef û armanca êrişên dewleta Tirk û çeteyên wê li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê, dagirkirina axa Sûriyê û bi dawikirina sîstema Rêveberiya Xweser a Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ye. Di vê çarçoveyê de hevserokê Kongra Islama Demokratîk Ebdulkerîm Saroxan ji rojnameya me re axivî.



**'Dewleta Tirk li gor projeya Mîsaqa Mîllî tevdigere'**

Saroxan diyar kir ku piştî ku rejîma Baas a dîktatoriya Esad bi dawî bû dewleta Tirk û hevkarên wê dixwazin hedef û armancên xwe pêk bînin û wiha got: "Dewleta Tirk li gor projeya xwe ya Mîsaqa Millî tevdigere ku herema Heleb, Reqa, Mûsil, Kerkûk û gişti Bakur û Rojhilatê Sûriyê li gor Mîsaqa Mîllî ji xwe re wek wîlayeteke dibîne û li ser erdê pêk bîne, roja ku ala Tirk li ser kelha Helebê hat rakirin dewlet Bahçelî diyar kir ku edî kelha Helebê gihaşt xwediyê xwe yên resen."

**'Dewleta Tirk dixwaze şerekî navxweyî bide çêkirin'**

Saroxan wiha domand: "Dewleta Tirk dixwast bi zindîkirina DAÎŞ'ê axa Rojava dagir bike û pirsgirêka kurd edî tune bike. Çeteyên dewleta Tirk û şofînîstên Sûriyeyê yên ku bi navê Itîlafê û bi navê opozisyonê, xwe li cem Tirkan bicîhkirin edî bûne alavekî destê Tirkan da ku di hemû şeren li cîhanê diqewime de bikartîne. Heman demê de Tirkiyê dixwaze bi destê wan şerekî navxweyî jî bide çêkirin ku kurd û ereb bihevdû bikevin, dewleta Tirk sedê sala ne bermahiyên osmaniyan bi vê siyaseta xwe tên naskirin. Hinceta dewleta Tirk hebûna kurd û sîstema kurdbûyînê ye, ji ber ku dewleta Tirk di nav kirîz û Kawsê de dijî ger li Sûriyê pirsgirêka kurd bê çareserkirin ew ê bandora xwe li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê jî bike ji bo ku bandora xwe neke dixwaze bi rêya çeteyan xwe tevlîhevî bide çêkirin û xira bike."

**'Dewleta Tirk dixwaze giştî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagir bike'**

Saroxan diyar kir ku dewleta Tirk gelê kurd bi terorê tewanbar dike, lê ew bixwe jî terorekî rêxistinkiriye ku sucên şer li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tîne, bi hezaran zarok û sivîlan dikuje û wiha li axaftina xwe zêde kir: "Ji ber ku Sûriye ber bi çareseriyekê ve diçe, Tirkiyê ji bo ku qezenc bike û bi lez û bez lingeke xwe çêbike dixwaze Kobanê, Reqa û Minbicê û hemû heremên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi kuştin û qetlîaman bigre. Şefê faşîst Erdogan di daxuyaniya xwe de jî dabû diyarkirin ku Şam, Himis, Heleb, Hema û Raqa ewê hemû bibin wîlayetên Tirkî, ew bi vî rengî bê hevî û bê îrade li gelê Sûriyê mêyze dike. Lê rastiya wî tune ye. Bi pêşengtiya kurdan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêkhateyên kurd, ereb û sûryan bi hev re bi yek projeye dijîn û yên ku pêşengtî ji vî projeye re dikin jî kurd bixwene, ji bo wî jî dixwazin ji bo ku ev proje were tunekirin pêwîste di seride kurd werin tunekirin. Şoreşa ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê çêbûye ew ê derbasî Tirkiyê jî bib,e ji bo ku pêşiya wê were girtin bi hemû hêza xwe êrîş dike."

**'Dewleta Tirk DAÎŞ'ê ji nûve zindî dike'**

Saroxan wiha domand: "Dewleta Tirk dixwaze bi van tevlîheviya nûjenkirina DAÎŞ bixwe re bîne ku carekdin DAÎŞ'ê vegere li ser linge xwe bisekine û xeteriyek mezin çêbike, 60 hezar malbatên DAÎŞ'î di kampan de û nêzîkî 12 hezar DAÎŞ'ê jî di girtigehan de jiyandikin. Hijmarek şaneyên veşartî jî di nav civakê de tevlîheviyan çêdikin û xeteriyên pir mezin bixwere tînin û dixwazin suriyê bikin xelekekî teng ku carekedin êrîş bikin, di navnetewî de jî xeteriyên pir mezin bixwere tîne û di bin gefên pir dijwar ji bo dewletên Avrupa, Amerîka û hêzên giştî yên cîhanê ji ber ku xwedî projeyek mezin û tundrevin. Turkiye her ku diçe hebuna xwe hunda dike dixwaze bi rêya DAÎŞ'ê carekdin hebûna xwe mayînde bike, ew jî tehdîteke pir mezine ji bo yekîtiya suriye yê û hêzên navnetewî hemandemê de ji bo koalîsyon nevnetewî a ku ji 40 welatî pêk tê û lihemberê DAÎŞ'ê şerkirin tehdîteke pir mezine.

**'Kirîza Sûriyê aloziya Rojhilata Navîn dirêj dike'**

Saroxan anî ziman ku "Li suriye yê liv û tevgerên pir bilez têne çêkirin û Hêzên navnetewî biryar girtine ku çareseriyekî bibinin. ji ber ku kirîza suriyê û aloziya rojhilata navîn pir dirêj kir ev jî dihêle ku zirar bigîhîje berjewendiyê hêzên hegemonîk û navnetewî ji ber wî jî dixwazin ku çareseriyê bibinin. Di pêkanîna rojhilata navîn û projeya rojhilata navîn a nû de suriye û civaka wî tê de cîh digrin pêwîste çareseriyê wî were diyarkirin.



**'Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pir reng derdikevin holê'**

Saroxan di dawiyê de got " Li Sûriyê pir reng derdikevin holê, mînak rengê îslamî ku bi navê HTŞ tê temsîlkirin renge reveberiya xweser yên ku gel pê bang dike û renge ku çeteyên tirkiyê pê bang dikin û gelek komên ku hê renge xwe nedane diyarkirin jî hene ji ber wî jî merhelekî pir girînge ku miletê suriyê bi giştî biryara xwe bi hevdure bidin ku edî renge suriyê dibe sîstemekî ku bakurê rojhilatê suriyê wek federalî bê naskirin. Heman deme de renge projeya Rêveberiya Xweser ku bikaribe xwe bi her awayê bi rêve bibe , yadin jî pêwîste di nav netewî de îtîraf bi pirsgirêka kurd were kirin ku edî kurd bi kurdbuna xwe were naskirin ku xwedî nasname, ziman, çand û diroke ger bi vî neye naskirin pirsgirêk û alozî her berdewam bike. Dewleta tirk astengiya çêdike ku ew reng çênebin û gelê kurd nebe xwedî çand ziman nasname û dîrok ji bo wî jî suriye ji bona gelan çareseriyekî nuye ku herkesek bi awayek demokratîk tê de cîh bigre."

# Dîrok nayê jibîrkirin

**Volqan Elî**

Împaratoriya Osmanî di sedsala 17. hemû Erebîstan, Rojhilata Navîn û Bakûrê Afrîkayê ji mêjve dagir kiribû. Û piştî wê çavên xwe berdabû hemû Awrupayê. Lê dema ku di sala 1687'an li pêşiya Wiyanaya Awûstûrya têk çû, hêviya xwe ji dagirkirina Ewrûpayê qut kiribû. Ji ber vê yekê ketibû pêvejoyeke paşdakişana erdên Anatolî û Kurdistanê. Ji sedsala 19. destpê kir heya bi Şerê Cîhanê yê Yekemîn erdên Kurdistanê talan û wêran bike. Bi taybetî di sedsalên 19 û 20'an de li beramberê gelên Yewnan, Ermen, Aşûr dest bi komkujiyên mezin kir.

Di Şerê Cîhanê yê I. de tenê di carekê de 1,5 milyon Ermen hatin qetilkirin. Yewnaniyên ku li Anatoliyê serîhildabûn bi jenosîdê re rû bi rû man. Ji aliyê împartariyê bêbext Osmaniyan ve ji welatê xwe yê 3000 sal hatin qewitandin. Împaratoriya Osmanî, îqtidara wê demê yanî Cemiyeta Îttîhad û Teraqî di wê pêvajoyê de berê xwe ne tenê dabû Ermen û Yewnanan, ji bo tepisandinê, kar jî li hev parve kiribûn. Serokên Îttihat û Terakkî yên wekî Talat; Ermenî bi kuştina, Enver; Kurd bikuştana û Cemal Paşa jî; Ereb di jenosîdê re derbas bikirana. Hêrsa ku di nav Ereban de li dijî zext û zilma rêveberiya Cemiyeta Îttîhad û Teraqî (dewleta Osmanî) bi pêş ket, ji aliyê rewşenbîrên Ereb ve veguherîbû bangên têkoşîna aktîf. Ew gotinên ku di danezaneke wê rojê de hatiye weşandin, vê hêrsê diyar dike: "...Ev kesên ku dijminatiya te û dijminatiya zimanê te dikin, ji welatê xwe paqij bike. Erebên Misilman û Xirîstiyan, li dijî dijminê xwe bibin yek, qet nebêjin ev Erebê Misilman e, ev Erebê Xirîstiyan e. Hûn hemû girêdayî Xwedayekî ne û ol ê Xwedê ye. Ji ber vê bibin yek... Ey Erebên Misilman, eger hûn bifikirin ku ev îdareya zalim îdareyeke Îslamî ye, hûn ê şaşîtiyeke mezin bikin. Lewma di pirtûka Xwedê de dibêje, 'zalim, bi xwe kafir in."

Ji ber vê yekê Osmaniyan (bi talîmatên Cemal Paşe) li dijî rewşenbîrên Ereb ên ji bo berxwedanê xwe bi rêxistin dikirin, pêla girtinê dest pê kirin. Paşê jî êvara 20'ê Tebaxa 1915'an rewşenbîrên ku ji girtîgehê derxistin ji saet 04.00'ê sibehê ve înfaz kirin. Rûspiyên ku 10 Misilman, 1 Xirîstiyan, 11 Ereb bûn, li meydana mezin a Beyrûdê, El-Bûrcê tên daliqandin. Koma duyem ku bi giştî 21 kes bûn, 17 Misilman û 4 jî Xirîstiyan bûn, 6'ê Gulana 1916'an bi berbangê re hatine îdamkirin. Dîsa 14 li El-Bûrcê, 7'ên din jî li Şamê, meydana al-Marjen tên înfazkirin. Yê biryarê dide û vê biryarê li dadgehê ferz dike, Cemal Paşeyê Osmanî ye. Di roja me de Ermenî çawa roja 24'ê Nîsanê wekî KARESAT, CİNAYETA MEZİN, wekî rojeke qirkirinê fêm dikin, Ereb jî ROJA 6'Ê GULANÊ WEKÎ ROJA ŞEHÎDAN bi bîr tînin. Dîrok ne tenê ji bo ku were bibîranîn bi xwînê hatiye nivîsandin; wan rewşenbîrên Ereb ku di 6'ê Gulana 1916'an de hatine daliqandin ji gelên Rojhilata Navîn, ji Ereb, Kurd û Ermenan re mîrasek bêhempa hiştine; "neyên lîstokê Osmaniyan, bibin yek û tola me rakin!"

Dîrok, niha ye! Osmaniyan doh çi kiribû, Osmaniyên Nû, Tayip Paşe û Hakan Fidan Paşe wê heman tiştî bikin. îbrahîm Kalin Paşe ne ji ber ku pir Misilman e hat li Camiya Emewî nimêj kir, Osmaniyên nû ji bo lîstokên nû xwe amade dikin! Ma zêdetirî deh sal e, yê Sûriye xirab kirine ne ew in? Kî ne gelo?



# 'Girtîgehên li herêmên dagirkirî ji Sêdnaya ne cudatirin'

Rêvebera Komaleya Mafê Mirovan a Sûriyê Evîn Cuma da xuyakirin ku kiryarên li herêmên dagirkirî tên kirin li dijî zagonên mafên mirovan e û wiha got: "Girtîgehên herêmên dagirkirî û kiryarên ku li wan deveran tên kirin, ji girtîgeha Sêdnaya ne cûdatire."

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Di cîhanê de gelek mînakên vê rêbazê hene û her çiqas navên van girtîgehan cuda bin jî, kiryarên ku li dijî girtiyan dikin heman in. Navê van girtîgehan li Fransayê dibe Bastille, li Kubayê dibe Guantanamo li Îranê dibe Evîn, li Tirkiyeyê dibe Amed, li Sûriyê dibêjin Sednaya. Piştî dagirkirina herêmên Kurdan navê wan girtîgehên navdar bû Efrîn, Serêkanî û Girê Spî. Derbarê binpêkirina zagonên mirovî û kiryarên li girtîgehên herêmên dagirkirî de, Rêveberiya Komaleya Mafê Mirovan a Sûriyê Evîn Cuma ji rojnameya me re axivî.

**'Herêmên dagirkirî kiryarên dervî mirovî hemberî şêniyan tên kirin'**

Evîn Cuma ragihand ku piştî dagirkirina Heleb, Til Rifet, Şehba û Minbicê kiryarên dijî mirovî û zagonî tên meşandin û wisa dest bi axaftina xwe kir: "Kiryarên li dijî welatiyan tên meşandin, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, taybet herêmên ku gelê Kurd têde jiyan dikin cihê metirsîyê ye. Gelek welatî bi tomêtên cûda hatine girtin û tên işkence kirin. Bi rastî jî, zextên ku girtîgehên rejîma Bees'ê yên wek Sidnaya dihate kirin, bi heman kiryarên xêrabtir girtîgehên herêmên dagirkirî tênkirin û ev pêş çavê hemû cîhanê tên meşandin. Di wan herêmên dagirkirî de nêzî 3 girtîgehên ku têde kiryarên weke işqence û kuştin têde tên meşandin hene. Heman demê de, li wan herêman 1400 kes çarenûsa wan ne dîyare û windan e. Rewşa wan girtîgehan ya Sidnaya pir xirabtir e. Xwe gihandin û agahî girtina welatiyên ku wan girtîgehan de hatine girtin pir zehmet e. Heman bajaran de yên dagirkirî heya niha 6 Hezar welatiyan di bin zextê hatine qetilkirin. Taybet jinên ku di wan girtîgehan de dihatin girtin, pêştî ku derketin dawî li jiyana xwe anîn. Li Efrînê 6 jinên ku tê payin li wan girtîgehan de mabûn dawî li jiyana xwe anîn e. Çeteyên girêdayî dewleta Tirk ya dagirker kiryarên hemberî jinên herêmê didomînin. Kuştin tecavûz û kiryarên cûrbicûr dijî jinan bikartînin. Em wek komeleya mafê mirovan ji bona lêpirsîn û derxistina rastiyan kar û xebatên xwe zêde bikin."

**'Em wek komele wan kiryaran bê hesap nahêlin'**

Evin girîngî da belge kirina kiryarên xêrab yên ku herêmên dagirkirî tên meşandin wisa domand: "Ev kiryarên wisa ber bi çavê hemû cîhanê tên meşandin. Ev hatine teqez kirin. Lê ti saziyên navnetewî û cîhanî heya niya bertek nîşanî bi wan kiryaran nedaye. Lê emê belge kirina wan kiryaran zêdetir bikin û teqez kirina qetlîamên



çeteyên dewleta Tirk ya dagirker bigîhinin raya giştî. Binpêkirina mafên mirovan û gelê me ti caran bêbersiv nahêlin. Ev belgeyên ku tên bidest xistin demildest ji bona komale û saziyên mafên mirovan re dê bên şandin. Gor zagonên navnetewî ger di şerê navbera dû welatan de tê kirin, windahîyên ku leşkerî yên welatîyên sivîl zêdetir bin ev şer tê bidawî kirin. Êrîşên dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên wê ne şer e, qetlîam û dagirkeriy e. Binpêkirinên mafê mirovan û welatiyên sivîlin. Cihekê ku zarok bên kuştin û qetilkirin wê derê qetlîam tên meşandin. Hecetên rayedarên dewleta Tirk ya dagirker yên parastina sînorên xwe derveyi rastî yê ne û derevin. Armanc qirkirina gelê Kurd û herêmê ne. Di gor zagonên xwe jî tevnagerin. 31 kilometre derveyi sinorên welatê xwe derketine ev dagirkirina herêmê ye. Ji ber ku cihekê biparêzin nîn e. Axa Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Her tim ragihandinê xwe de gefan dixe û dibêjin "Em nêzî sinorên xwe welatekî binavê Kurdistan na pejirînin." Ev tê wateya ku derdê wan ne parastine derdên wan deskeftiyên Kurdan û mafên wan yên bingehine û di heman demê de têkbirina Rêveberiya Xweser e."

**'Piştî hilweşandina Rejima Bees'ê metirsî zêdetir bûy e'**

Evîn balkişand li ser piştî hilweşandina hikûmeta Rejîma Bees'ê, û komên çete dagirkirina paytext Şamê metirsîya li ser binpêkirina mafên mirovan û axaftina xwe wisa qedand: "Bi alîkariya Komaleya Mafên Mirovan ya Efrînê hejmarek zêde welatiyên ku çarenûsa wan ne diyar hatin peydakirin. Ev kesên ku hatin dîtin ji bona Komaleya Mafên Mirovan ya Lêpirsînê a Ewropa yê ve hatin şandin. Wek komale me pêşniyara bi navbeynkariya NY emê ji bona lêpirsîna kesên winda derbasî herêmên dagirkirî bibin. Piştî hilweşandina Rejîma Bees'ê metirsîyên me zêdetir bûy e. Gelo HTŞ û komên çekdar yên girêdayi dewleta Tirk ya dagirker kiryarên xwe yên Efrînê û Serekaniyê û Girê Spî dê Şamê ji bimeşînin? Ji ber ku berê jî me raya giştî ragihandi bû kul i herêmên dagirkirî û işqenceyên ku tên kirin hemê bi destê MIT'ê tên rêvebirin. Banga me ji bona saziyên navnetewî yên mafê mirovan û kesên zagonsaz e ku hemberî wan kiryarên dijî mirovî bisekinin."

## Gelê Kurd dê bi Rêbertiya xwe re bi serbikeve

**Zekî Bedran**



Piştî demeke dirêj li ser daxuyaniyên Bahçelî ên di derheqê Rêbertî de derbas bû şûn de desteya DEM'ê çû Îmraliyê. Di vê navberê de erîşên dagirkeriya dewleta Tirk jî li ser Rojava zêdetir bû. Ji aliyekî ve şerekî derûnî yê berfireh hat meşandin. Gotin dê Rêber Apo bangawaziya çek danînê bike û bi vî awayê di raya giştî de bendewariyek ava kirin. Bi têkbirina şoreşa Rojava an jî dagirkirina qadên berfireh ve xwestin destê Rêbertî lewaz bikin. Ji aliyekî ve dijminahiyeke mezin, Kurd bê statû hîştin, li hember Kurdan xwesteka piştgiriya Cîhanê ji aliyekî din ve jî demogojiya Biratiya Kurd û Tirkan li der dor serwer bû. Di nav van geşedanên bi nakok û dijminahiyê de deste şandin Îmraliyê. Rêber Apo berê jî dabû xuya kirin. "Ji bo çareserkirina pirsgirêkê ya ji aliyê polîtîk û zagonî ve ez xwediyê hêza teorîk û pratîk im." Ên ku dewletê rêve dibirin dema ku di sala 2015'an de mase hilweşandin, gotibûn "Me pêvajoya Çareseriyê rakir dolaba qeşa." Di heman demê de bi israr daxuyaniyên wek "Dê êdî Îmralî û partiyên mîna DEM'ê derveyên pêvajoyan bimînin" dan. Ji bo ku vîna gelê Kurd bişkînin û bêhêvîtiyê ava bikin propagandaya reşkirinê ya bêhempa kirin. Gotina "Me gerila qedand, bê hêz hişt, nikarin êdî bilivin, heta gerîllayê dawî emê têbikoşin" serwer kirin.

Bi êrîşên li ser Rojava û gotinên 'Têkoşîna bi terorê' ve çûne Îmraliyê. Qaşo di Sûriyê de serkeftî bûn, hevkarê wan HTŞ heta Şamê çubû û serwer bibûn. Êdî dawîya PYD'ê û QSD'ê ya ku dihat bendewar kirin 'Di nava mirinan de mirinekî biecibîne bû.'' HTŞ qaşo navdar kirin. Ji bo ku wan berê ser QSD'ê bidin û gelê Kurd derveyê hevkêşeya Surî bihêlin bi awayekî awarte kar kirin. Xwasteka dewleta Tirk bi ti awayî Kurd tevlî pêvajoyê nekirin bû. Ger ku Kurd bibin xwediyê maf û zagonan û bigihîjin statuyekî dê cîhan hilweşe. Ev yek ji bo xwe jî û cîhanê jî wek xeta sor diyar kirin. Di pêvajoya ku bê navber domandina vê karê de çuyina wan ya li Îmraliyê divê pir bi baldar were desgirtin. Raste çuyina wan ya li Îmraliyê ne çawa lê hat bû. Piştî pêvajoyeke nirxandina kûr şûn de çûn. Wek me got, bi avakirina zexteke mezin ya li ser Rêber Apo, di raya giştî de bendewariyeke mezin ya çek berdanê avakirin şûn de destûr dan ku deste biçe. Delîlên derdor amadebûna AKP-MHP'ê ya naskirina Kurdan an jî guhartina hişmendiya wan nîne. Pirsgirêka wan ya bingehîn beralîkirina berxwedan û têkoşîna Kurdan e. Di sala 2015'an û vir ve konsepteke şerê mezin û êrîşan pêk anîn. Lê bi erîş û şeran ve negihîştin armancên xwe. Derveyê wê ev di Sûrî de bi kêfxweşiya serkeftinê bijîn û bendewariyên xwe bilind bikin jî di rojhilata navîn de pêşketinên awarte didomin. Dê pêvajo veguhere çi rewşê nizanin. Erdogan bi serkeftina Trump ve pir kêfxweş bubû. Wisa hesap dikir ku wê bi Trump re hevbike û koka Kurdan bîne. Lê diyare ku dê stratejiya Trump li ser parastina Îsraîlê be. Vê dibînin. Ji ber vê bendewariyên wan bilind nîne. Ji bo vê armanca wan, pêşiya ku Bîden biçe di vê navberê de di hesabên lêdana Kurdên Rojava ve bi destekî xurt çiwyina li ser maseyê ye. DYA dê çi ji Iraq û Îranê bike nediyar e. Lê tê zanîn ku dê wan deran wisa hesan jî bernedin. Ji ber vê herem ji şimitandinê re vekirî ye, bi qeyran û alozîyan tijî ye. Ji bo vê Erdogan û Bahçelî qasî ku ji destê wan hat dixwazin Kurdan bixin di bin serweriya xwe. Ewqas rojevkirina Îmraliyê jî ti awayê mixabanîya kiryarên xwe an jî guhartina hişmendiya wan ve têkildar nîne. Nikarîbûn PKK û gerîla têk bibin. Armanca wan Rêber Apo tenê hiştin û bê hêz xistin bû. Bi salan di bin tecrîdeke giran de hîştin. Hemû Zagon û pîvanên exlaqê avêtin bin lingan. Lê nebû, mecbûr man û çûn Îmrali yê.

Dê ji van hevdîtinan tiştek derbikeve, mirov çiqas cîdî bigre? Di nava gel de li hember dewletê nebaweriyekî mezin heye. Rêber Apo gelek caran agirbest îlan kir. Di sala 2013'an de kedeke mezin raber kir. Sebreke mezin nîşan da û heta ji destê wî hat nerm nêz bû. Lê dewletê tercîha xwe li ser ''Plansaziya Çokdanînê'' ava kir. Sicîl û armanca dewletê pir xirab e. Lê belê hêz û rêya serkeftina Kurdan jî hene. Wana xwestin ku hêviyên Kurdan bişkînin. Li hember vê Kurdan jî bi inyat û fedekariyên mezin ve liberxwe da. Ev şer bi cihekî vegeriya şerê şikandina vîn e. Ruxmê her tiştî jî Kurd li ser piya ne û deskeftîyên xwe diparêzin.

Gelê Kurd û rêxistinên wan, hêzên welatparêz çiqas baweriyê bidin Rêberê xwe, hêza xwe ya cewherî û berxwedana xwe dê ewqas hemû pêvajoyên zehmet bihêz derbikevin. Divê hêzên şoreşger bi awayekî çalak tevlî vê pêvajoyê bibin û ristekî bibandor bileyîzin.

## Kodên hevdîtina li Îmraliyê



**Farûk Sakik**

Di sicîla dewleta Tirk a sala 2024'an de yek tiştek baş derket pêş. Bawerî bi nexşeriya çareseriya Rêber Apo anî û heyetek şand Îmraliyê. Endamên heyeta DEM Partiyê Pervîn Bûldan û Sirri Sureyya Onder bi Rêber Apo re 3 saetan hevdîtin pêk anîn.

Dewleta Tirk di pêvajoyek ku li Rojava ji bo tunekirina Kurdan çi ji dest dihat pêk danî de, çima serî li vê hevdîtinê da? Dewleta Tirk geşadanên îroj li erdnîgariya me pêk tên de, serdemek dijwar dijiya. Bilî Kurdan deriyek ku lê bide tunebû. Li çareseriyek digeriyan. Ev yek 3 meh berê ferq kiribûn lê dîsa jî şansê xwe diceribandin. Li aliyek jî hin şertên bi tenê berjewendiyên xwe derdixistin pêş û dixwestin bi Ocalan bidin qebûl kirin. Rêber Apo ev yek qebûl nedikir. Herî dawî neçar man û xwe avêtin ber deriyê zanyariya Rêber Apo ya salan.

Heyetê, fikir û nêzîkatiyên Rêber Apo yên ji 7 xalan pêktên bi raya giştî re parve kirin.

Em ê ji van heft xalan, xala; Heyet wê vê nêzîkatiya min hem bi dewletê re hem jî bi derdorên siyasî re parve bike. Di vê çarçoveyê de amade me ku gava pozîtîf a pêwîst biavêjim, bangawaziya pêwîst bikim. Rêber Apo, di demek waha ya dîrokê de, dixwaze herkes dahîlî pêvajoyê bibe. Divê civak nîqaş bike. Naxwaze bi tenê Erdogan û Bahçelî re, di heman demê de derdorên siyasî hemû tevlî vê pêvajoyê bibin. Hin kes çewt dinirxînin û digihîjin encamên şaş. Rêber Apo tucarî gavek li dijî berjewendiyên gelê Kurd û Tirk û gelên Rojhilata Navîn navêje. Dema ku em li 26 salên sekna wî ya Îmraliyê binêrin ev rastiyê were dîtin. Hin kes û alî bi taybet ji Rêber Apo xwestin ku bangawaziya çek danînê bike. Di daxwiyaniyê de em dibîni ku Rêber Apo ev yek bi hin şertan ve girêdayiye. Dema ku ev şertên wî werin cîh wê banga vê yekê bike. Şert û lihevkirinek çawa? Lihevkirin wê di rojên pêşde zelal bibe. Lê em vê yekê dizanin û wî baş nas dikin, tu carî biryarek li dijî doza Kurdistan nagire. Ji bo ku ew dîroka wan a sed salî baş dizane. Kurd çawa hatine xapandin baş dizane. Wê demê xwişk û biratiya Tirk-Kurdan çawa hatibû heba kirin, baş dizane. Îroj, heta hin tişt di destûra bingehî de mîsoger nebin, an jî di pratîkê de nekevin meriyetê, ew bangê neyê kirin. Ji xwe Kurdan çek û rextê xwe li dîwarê xwe daliqandine. Kurd li benda aşitiyê ne. Roj were û pêwistî pê hebe wê were bikaranîn. Heger Rêber Apo were guhdar kirin û hin gav werin avêtin, ji xwe wata ya çek namîne.

Em vê yekê ji ku dizanin? Heger hin şert îroj zelal bibûna wê Rêber Apo banga çekdanînê bikira. Lê nekir. Her wek bibêje hên wext heye. Gelê Kurd ji Rêber Apo bawer dike. Ne tenê gelê kurd di heman demê de gelên Ereb, Ermen, Tirk û Cihû jî dizanin Rêber Apo mafê wan esas digire û pê bawerî tînin. Gelên Kurd bi hemû hêzên xwe li kêleka Rêber Apo cîh digire.

Piştî vê hevdîtinê û kodên çareseriyê, berpirsyariyek di nav civakê de derdikeve pêş. Divê civak ji bo azadiya Rêber Apo zextan bide hikumeta Erdogan. Divê dewleta Tirkiyê jî vê yekê bibîne û ji bo Rêber Apo di çareseriya pirsgirêkan de hîn aktîv rol bileyîze, azadiya wî esas bigire.